
Xiwandinek Hevberkirnê di navbera helbesta Kurdî û Farsî de

Kerîm Ekber Zade

**Elêlê gulê gulhevalê
Şevê li xewnê û rojê li xeyalê
Rabe rabe rabe
Bila şemalê sibê li nalê ruyan
belav be
Bila dilê wî aşiqî şa be
Elêlê gulê rabe**

Bo her edebvan û şayêrek kurd ev mesele eşkereye ku li edebyatê de dan û standinek bi xeml li nav edebyata kurdî û zimanên cînar li rojhilata navîn heye û ev yeke eger bi dirostî were bikar girtin başe, lê ev xemla çaxekî erzişta xwe peyda dike ku babetên du aliye vê dan û standinê were berçav girtin.

Li ser peywendiya şêrên kelasîke kurdî û farsî gelek hatiye nivîsîn, lê li vê

peywendiyê hizir dikim babetek nehatiye berçav girtin û ew babeta şêrên nûjene.

Li ser destpê bûna şêrên nû li zimanê farsî hertim hatye gotin ku nîma yoşic (Alî Isfendyarî) xîdarê vê stîlê bûye û li babet sê xiştiyan jî Exewan Salis xîmdar dizanin û niha dîroka van du stîlan li zimanê kurdî jî piştî vê gotin ku bo nimûne nîma ev stîla ji edebyata hate girtin. Eger mirov berê xwe bide ser edebyata kurdî bi başî jêre eşkera dibe ku ev du stîlîlana ji berê va li nav edebyata kurdî de hebûne.

Herçend tê gotin ku Goran bavê şêrên nûya kurdiye, lê tu şayêrek kurd gereke rola heyranên kurdî yan jî şêrên Feqîhê Teyran, lo û şêrên nûye kurdên Xurasanê jibîr neke.

Eger şayêr û edebvane kurd lêkolînekî




Feqiyê Teyran

kûr li ser şêrên kurdan û bitaybet kurdên Xurasanê bikin bi rehetî ev yeka ji wan ra eşkera dibe ku şêrên nûye kurdan û bitaybet kurdên xurasanê kevnariyekî xweye dîrokî hene û em dikarin bêjin ku şêrên nûye farsî xelateke ku şêr û edebyata kurdî daye zimanê farsî.

Helbet ev mesela dibe bayis ku ehmiyeta şêrên nûye farsî jî zêde bibe û xîm û binyatekî dirêj û dêrokî bigre, çima ku tu kes nikare peywendiya nîzik û wekheviya du zimanên kurdî û farsî înkâr bike.

Yek din ji babetên herî muhîme edebî nû ya kurdên xurasanê yan sê xiştî ye. ev cure şêr gotina ji berê va li nav kurdên xuristanê rewac hebû. bi corekê ku parek pir ji şêrên kurdên xurasanê li vê çarçûvê da hatine gotin.

**Ez xerîbê vê erdame
Giriftarê vî derdame**



Goran

Ne kuştîme ne berdame

Li bara vê stîlê jî li nav edebyata farsî Exewan Salis şayêrê binav û dengê vê derwanêye Xanê xîmdarê sê xiştîyan dizanin ku li vê barê dîsa jî em dikarin bêjin lêkolên edebyata farsî qet ser vê rola edebyata kurdî li nav edebyata farsî ne ax.

Li her halî da tu kurdek nikare şanaziyê bi edebyata xwe bike bê ku rola heyran, lo herya, sê xiştî,....., li nav edebyata kurdî ji bîr bike, evan çarçûvên ku me êşarey wan kirin ji xîm û binyatên edebyata kurdî tên hêsan. çiqas baş dibe ku li nav edebyata farsî jî li ser van babetan û babetên dine hevpar behs dibû.

**jiyaya ser me erz rûme.
Tijî gul û tijî tûme
Çen salin ku jê dûr bûme.**